



Sûrûd û

Eger zivistan

Mueyed TEYIB

Eger zivistan
Husa ya sar neba
Befir jî husa
Ya tezî ne ba
Ez da çime nav
Bê gore û bê pêlav
Bê çake û bê
Dezgork û kulaw
Xaniyekî çêkem
Hindî xwe bilind
Baxçeyek li ber
Wek buhara rind
Li dora şînbîn
Kezan û dîndar
Dar berwî û gihîşk
Hijîr û hinar
Tayên wan bibîne
Heşar û hêlîn
Bo çûçkên sire
çengêt wan birîn
Hêlayne birsî
Bê çer û çerwan
Da bêne lîsî
Ew çûçkên cuwan

12

Helbest



Elind MIZURÎ

MÎN

Hevalên naz û cuwan
Me welate Kurdistan
Dijminan lê çandin mîn
şûna nêrgiz û gulan

Dema diçine seyranê
Li aqarî diken geryanê
Hişyar bin li cihên
mînan
Da li we neken zîyanê

Neçin çi cihên veder
Yên kaviil û bi sengel
Dûr nîne mîn lê hebin
Gîya û ax ketbine ser

Li wan cihên mîn têda
Sêgoşeka sor têda
Mîrnê ya xwe veşart
Nekevîne di dava wê
da

